K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

TELAFÛZKIRINA BÊDENGÊN NÊZÎ HEV BI SAYA ZÛGOTINOKAN LI CEM ZAROKÊN PÊŞDIBISTANÊ

Sevda BASUT

15721085

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

TELAFÛZKIRINA BÊDENGÊN NÊZÎ HEV BI SAYA ZÛGOTINOKAN LI CEM ZAROKÊN PÊŞDIBISTANÊ

Sevda BASUT

15721085

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

KURTE

Zûgotinok ew cure gotinên qalib in ku exleb ji hêla zarokan ve di lîstokên gelêrî û lîstokên cuda cuda de ji bo geşedan û gerîna zimên tên bikaranîn. Zarok, bi saya zûgotinokan gelek hêmanên zimên bi hev re bi kar tînin. Her wiha zûgotinok di edebîyata zarokan de xwedî cihekî girîng in. Di perwerde û hînkirina Kurdî de kartêkê lê zêde dikin. Bi saya zûgotinokan zarok hînî hînbûnê dibin.

Zûgotinok ew berhem in ku li gorî geşedana ziman û temenê zarokan in, zarok li gel şabûnê perwerde jî dibin. Anku zûgotinok ew keresteya tabiî ye ku zarok ji bo ku qabilîyeta zimanê xwe pêş bixin ew hilberandine

Di gramera kurmancî de 23 herfên (deng) bêdeng (dengdar/consonants) hene ku jê hin deng gelekî nêzingî hev in. Ev nêzikatî carina li gorî cihê derketina deng e, carina li gorî asta derketinê, carina li gorî asta domdarîyê wan e û carina jî li gorî her sê taybetîyan e. Aheng di zûgotinokan de bi saya dengên nêzî hev pêk tê. Di zûgotinokên kurdî de gelek caran hebûna qafîyeyê ahengê temam dike.

Ev xebat xwedîyê wê tezê ye ku dibêje zarokên di qonaxa pêşdibistanê de bi saya zûgotinokan dikarin dengên bêdeng ên nêzikî hev ji hev cuda bikin û bi awayekî durist dengan bilêvînin. Gerdûna vê xebatê ji zûgotinok û geşedana zimên pêk tê, binegerdûna wê jî ji bêdengên nêzî hev û ji hin zûgotinokan (di nava xwe de bêdengên nêzî hev dihewînin) pêk tê.

Peyvên Sereke: zûgotinok, dengên bêdeng, zarok, perwerde, geşedana ziman, pêşdibistan.

ÖZET

Tekerlemeler genellikle çocuklar tarafından geleneksel ya çeşitli oyunlarda kullanılan söz kalıpları olmakla beraber dil gelişimi için de önemli bir etkendir. Tekerlemelerle çocuklar dilin pek çok unsurunu bir arada kullanır. Tekerlemeler çocuk edebiyatında önemli bir yere sahiptir. Kürtçe'nin eğitim ve öğreniminde katkı sağlar. Tekerlemelerle çocuklar öğrenmeyi öğrenir.

Tekerlemeler çocuğun dil gelişimi ve yaşına uygun eserlerdir, çocuklar eğlenmenin yanı sıra öğreniyor da. Yani tekerleme, çocukların dil yeteneğini geliştirebilmesi için üretilen doğal unsurlardır.

Kurmancî gramerinde 23 sessiz harf vardır ve sesin çıkış noktası, sesin çıkış derecesi ve sesin süreklilik derecesine göre de biribirine yakın olan sessiz harfler vardır. Tekerlemelerde ise aheng birbirine yakın sesler sayesinde oluşur. Kürtçe tekerlemelerde kafiyenin varlığı genel olarak ahengi tamamlar.

Bu çalışma, okul öncesi çocukların tekerlemeler sayesinde birbirine yakın sessiz harfleri ayırt edebilecekleri ve engelsiz bir şekilde o sesleri çıkarabilecekleri tezini savunmaktadır. Bu çalışmanın evrenini tekerleme ve dil gelişimi; örneklemini ise birbirine yakın sessiz harfler ve bu harfleri barındıran tekerlemeler oluşturmaktadır.

Anahtar Kelimeler: tekerleme, sessiz harfler, çocuk, eğitim, dil gelişimi, okul öncesi.

KURTEBÊJE

ens. : enstîtu

c. : cild

j. : jimar

k. : kovar

nql. : neqqal

r. : rûpel

s. : sal

w. : wergêr

weş. : weşanxane

NAVEROK

KURTE ..... **III**

ÖZET ..... **IV**

KURTEBÊJE ..... **V**

NAVEROK ..... **VI**

DESTPÊK **1**

BEŞA YEKEM **2**

1. GEŞEDANA ZIMAN **2**

1.1. GEŞEDANA ZIMAN LI BA ZAROKÊN PÊŞDIBISTANÊ 3

1.2. TÊGEHÊN SEREKE DERBARÊ GEŞEDANA ZIMANÊ ZAROKÊN PÊŞDBISTANÊ DE 3

1.2.1. Qayîdekirina Zêde 3

1.2.2. Qayîdekirina Kêm 4

1.2.3. Zimanê Kiryar û Zimanê Îfadekar 4

1.2.4. Monolog 4

1.2.5. Zimanê Ezperest 4

1.2.6. Zimanê Civakî 4

1.2.7. Dubarekirin 4

BEŞA DUYEM **5**

2. CUREYEKÎ EDEBÎYATA GELÊRÎ: ZÛGOTINOK **5**

2.1. SENIFANDINA ZÛGOTINOKÊN KURDÎ 5

2.1.1. Zûgotinokên Lîstokî 6

2.1.2. Zûgotinokên Xeberoşkî 6

2.1.3. Zûgotinokên Serbixwe 6

2.2. CUREYÊN ZÛGOTİNOKÊN KURDÎ Lİ GORÎ CİHÊ BİKARANÎNÊ 7
2.2.1. Qinik 7
2.2.2. Bend 7
2.2.3. Zûgotinokên Lîstokan 7
BEŞA SÊYEM 9
3. ROLA ZÛGOTINOKAN BO GEŞEDANA ZIMANÊ ZAROKÊN PÊŞDIBISTANÊ 9
3.1. JIHEVKIRINA HERFÊN BÊDENG ÊN NÊZÎ HEV 9
3.2. TABLOYA BÊDENGAN Û RÊJEYA BIKARANÎNA DENGÊN KURMANCÎ. 10
3.3. DENGÊN NÊZÎ HEV Û WEK ÇARESERÎ MÎNAKÊN ZÛGOTINOKAN 11
ENCAM 15
ÇAVKANÎ 16

DESTPÊK

Têkilîya zarokên pêşdibistanê (4-6 salî) ji hêla geşedana zimên ve bi gramerê xurt dibe. Di vê qonaxê de ji bo geşedana zimên telafûzkirin, jihevkirina dengan û axaftina herikbar û bêşaşî girîngîya zûgotinokan derdixin pêş. Zûgotinok hem eşqa zimên li zarok peyda dike û hem jî bi qasî lîstokekê zewqê didin zarokan.

Di vê xebata xwe de em li ser mijarên wekî geşedana ziman, taybetîyên zimanê zarokên pêşdibistanê, girîngîya zûgotinokan wek çareserîya geşedana zimên û wd. rawestan. Di vê xebatê de armanca me ew e ku em problemên zimanê zarokên pêşdibistanê nîşan bidin, girîngîya zûgotinokan îspat bikin. Çinku zarok pêşeroj in û pêşeroja zimên jî girêdayî pêşeroja zarokan e.

Armanc û girîngîya vê xebatê ew e ku ji bo geşedana ziman(ê zarokên pêşdibistanê) kêmasî û xalên krîtîk tespît bike û weke çareserî jî berê xwe bide zûgotinokan. Çinku hinek dengên bêdeng ên nêzingî hev têne tevlîhevkirin û telafûza wan zehmet e. Zûgotinok jî ji bo vê problemê dikarin bibin çareserî.

Çavkanîyên me ji qada pedagojîyê ne, exlebê mînakên zûgotinokan jî me ji medyaya sosyal wergirt, dîsa hin jê aîdî Herêma Botan in û hin jî aîdî Kurdên Şingalê ne. Ji ber ku xebata termînolojîya pedagojîyê bi awayekî rêkûpêk nehatîye kirin lew me Îngilîzîya hin têgehan di nava kevanekê de daye.

Di beşa yekem a vê xebatê de em li ser geşedana ziman û li cem zarokên dibistanê qonaxên geşedana ziman, pratîk û zehmetîyên bilêvkirina peyv û dengan rawestane. Di beşa duyem de weke cureyeke edebîyata gelêrî me berê xwe daye zûgotinokan, em li ser taybetî, senifandin û cihê wan ê bikaranînê rawestane. Di beşa sêyem de jî me bi tabloya dengan "bêdengên nêzî hev" û "rêjeya bikaranîna dengan" daye ku ji hêla zarokan ve telafûzkirina wan dengan zehmet e. Bi mînakên zûgotinokan û ravekirinan me teza xwe daye pêş.

BEŞA YEKEM

1. GEŞEDANA ZIMAN

Ziman, sîstemeke razber a ragihanê ye ku ji nîşanderên (*indicator*) devkî û nivîskî pêk tê û mirovan ji candarên din cihê dike. Her wiha, mirov dikare bibêje ku ziman semboleke sosyalîzasyonê ye jî. Çinku mirov bi kesên din re bi saya zimên ragihanê (*communication*) pêk tîne.

Geşedana zimên di qada pedagojîyê de beşeke girîng a psîkolojîya geşedanê ye. Geşedana zihnî û geşedana zimên li gorî geşedanên din bêtir di nava têkilîyeke xurt de ne. Anku ev her du qadên geşedanê hevterîbê (*parallel*) hev in û hev temam dikin. Bes da ku bêtir bê fêmkirin jev cuda têne analîzkirin. Geşedana zimên; li gel binyada bîyolojîk her wiha ji şeklê ragihana endamên malbatê, rewşa sosyoekonomîk, nakokîyên hestewar, nexweşîyên tibî û zayendê jî tesîrê digire (İhtiyaç Akademi, 2016:103).

Derbarê geşedana zimên de gelek teorî derketine pêş; ji nava van teorîyan 4 jê girîng in: Teorîya Psîkolenguîstîk, Teorîya Tevgerîtîyê, Teorîya Hînbûna Sosyal û Teorîya Serdemî. Teorîya psîkolenguîstîk geşedana zimên bêtir bi bîyolojîyê ve girê dide ku pêşengên vê teorîyê Chomsky û McNeill in. Li gorî Chomsky mejîyê her zarokî xwedîyê wan sinîran e ku bi saya wan zarok dikarin bi rehetî zûgotinokan bilivînin û zimanê xwe bigerînin; her wiha ev yek parîyekê girêdayî şert û mercên dorhêlê (*environment*) ye jî.

Teorîya tevgerîtîyê jî geşedana zimên girêdayî bi xurtkirinan (reinforce) e û pêşengê vê teorîyê jî Skinner e. Li gorî vê teorîyê mirov dikare bibêje ku zarok bi teqlîd, dubarekirin û jiberkirinan dikarin zûgotinokan bilivînin û bi vî awayî geşedana zimên pêk bînin. Li gorî teorîya hînbûna sosyal jî zarok malbata xwe an jî kesên nêzingî xwe teqlîd dikin û wan model digirin, bi vî awayî jî geşedana zimanê xwe pêk tînin. Teorîya Serdemî geşedana zimên li gorî kronolojîyê dike çar qonax: Qonaxa Edekirinê[1] (0-12 mehî), Qonaxa Yekpeyvî (12-18 mehî), Qonaxa Axaftina Telegrafîk (18-24 mehî) û Qonaxa Ewil a Gramerê (24-72 mehî). Ji ber ku xebata me li ser zarokên pêşdibistanê ye qonaxa ku me eleqedar dike *qonaxa ewil a gramerê* ye.

[1] Gotinên ewilîn ên bebeka ku exleb dengek weke “ede, ede” derdikeve.

1.1. GEŞEDANA ZIMAN LI BA ZAROKÊN PÊŞDIBISTANÊ

Yek ji armancên sereke yên perwerdeya pêşdibistanê ew e ku ji bo dibistana seretayî gihandina zarokan e. Bi taybetî jî di azmûngerîyên salên ewil ên serketina zarokan de perwerdeya pêşdibistanê roleke sereke li ser xwe digire.

Eger em ji hêla geşedana zimên ve li ser mijare bisekinin, em ê bibinin ku zarokên pêşdibistanê (ku zarokên pêşdibistanê 4, 5 an jî 6 salî ne) dema 4 salî bin di xezneya peyvên wan de nêzingî 1500-2000 peyv hene, gelek pirsan dikin û hevokên kompleks bi kar tînin. Zarok %90'ê rêgezên gramerê di 5 an jî 6 salîya xwe de temam dikin. Di xezneya peyvan a zarokên 5 an jî 6 salî de 2-3 hezar peyv bo axaftinê û 2-24 hezar peyv jî bo fêmkirinê hene (Dağabakan ve Dağabakan Ö., 2006: 6). Li gorî Ekinci, %70'yê geşedana zimên a zarokan di temenê 0-6'an de pêk tê, ku ev tekabulî geşedana zekayê jî dike (Ekinci, 2001: 19). Lew em bi rehetî dikarin bibêjin ku pêşdibistan hem ji bo geşedana zimên û hem jî bo geşedana zekayê divê bibe pêvajoyeke zarûrî ya perwerdeyê.

Ji bo geşedana zimanê zarokên pêşdibistanê herî zede çalakîya xwendina çîrokan derdikeve pêş û dûv re jî bilêvkirina zûgotinokan.

1.2. TÊGEHÊN SEREKE DERBARÊ GEŞEDANA ZİMANÊ ZAROKÊN PÊŞDİBİSTANÊ DE

Derbarê geşedana zimên de hin têgehên sereke hene ji bo gerîna zimên (telafûzkirin) dibin kêşe û arîşe. Em ê jî van têgehên sereke li gorî geşedana zimanê zarokên pêşdibistanê binirxînin.

1.2.1. Qayîdekirina Zêde

Zarokên pêşdibistanê ji ber ku di qonaxa ewil a gramerê de ne lewma dema hînî qayîdeyekê rêzimanê bibin wê qayîdeyê di her qada zimên de bi kar tînin. Bo nimûne, di gramera kurmancî de pêşgira "ne-" wateyeke neyînî dide peyvê: nexweş, nezan… Her wiha pêşgira "bê-" jî wateyeke neyînî dide peyvê. Zarok ji ber ku hînî "ne-"yê bûye dişê bo "bê-"yê jî "ne-"yê bi kar tînin; anku şûna bêje "bêzirav", dibêje "nezirav".

1.2.2. Qayîdekirina Kêm

Qayîdekirina kêm tam tersê qayîdekirina zêde ye. Wekî ku tê zanîn peyva “firoş”ê wateya “kesê ku tiştina difroşe” li peyveke din zêde dike: mastfiroş, cilfiroş, gulfiroş... Li gorî vê têgehê zarok dema hînî peyva “-firoş”ê bibe wê peyvê bi peyvên din re girê nade. Anku şûna bêje “gulfiroş”, dibêje “kesê ku gulan difiroşe”.

1.2.3. Zimanê Kiryar û Zimanê Îfadekar

Di geşedana zimên de ewil zimanê kiryar, dûv re jî zimanê îfadekar derdikeve pêş. Li gorî vê qayîdeyê eger em ji zarokeke 18 mehî bibêjin “kanî mîyaw?” dê rabe li pisîkê bigere. Lê em vê pirsê li gorî gramerê bi awayekî duristtir bikin dê zarok tênegihe. Ku têbigihe jî dê di warê bersivê de zehmetî bikişîne.

1.2.4. Monolog

Zarokên pêşdibistanê bêyî ku armanceke wan a guhdarkirin an jî fêmkirinê hebe bi dubarekirinan xwe bi xwe re diaxêvin. Piaget ji vê yekê re “monolog” dibêje. Anku zarok bêyî hemdê xwe tiştine di binhişîna xwe de dilivînin û gelek caran jî tiştine bêwate jê dertê.

1.2.5. Zimanê Ezperest

Zarok di dema axaftinê de bêyî ku empatîyê bike her û her bi ya xwe bike, bi tenê hest û ramanên xwe referans bigire wê hingê ew zarok jixweqayêl e; anku zimanekî ezperest lê peyda dibe. Li gorî Piaget ev taybetî heya “qonaxa karên şênber(6-12 salî)” didome (Budak, 2000).

1.2.6. Zimanê Civakî

Zimanê civakî ew têgeha geşedana ziman e ku ji axaftinên ragihana civakî (agahîdan, pirskirin, tehdîtkirin, emirdan û wd.) pêk tê (Vygotsky, 1998: 73). Vê têgehê L. S. Vygotsky li pedagojîyê zêde kirîye. Zimanê civakî di heman demî de sosyolojîya zimanê zarokan jî radixe ber çavan.

1.2.7. Dubarekirin

Dubarekirin ew lêker e ku zarok çi ji kê bibîhîsin wê carî dikin. Zarok tiştine ku kesên din dibêjin li ser hev dubare dikin, ji wan we ye ku dê bi vî awayî hînî tiştekê bibin. Li gorî Piaget %1 an jî %2’yê axaftinên zarokên di “qonaxa berî kar” de dubarekirin e.

BEŞA DUYEM

2. CUREYEKÎ EDEBÎYATA GELÊRÎ: ZÛGOTINOK

Zûgotinok di zimanê Îngilîzê de tekabulî "jingle", di Almanî de jî tekabulî "stereotyper formel" dike. Di dîyalekta Kurmancî de ji vê yekê re ji xeynî zûgotinokê "lezbare", "zûgotin" jî tê gotin. Di zûgotinokan de wate dimîne alîyekî, ji wateyê bêtir lîstina bi peyvan, aheng, ahenga dengan, qafîye, dubarebûna peyvê û helbestvanî derdikeve pêş. Ji ber vê çendê dibe ku peyvên ku ji hêla wateyê ve dûrî hev werin li gel hev û ji peyvan zincîreyeke bêwate peyda bibe. Zûgotinok ji hêla rûxsarê ve carinan pexşanî ne, carinan vegêraneke helbestî ne, carinan jî bi risteyan temamî helbestî ne. Ji ber vê çendê mirov dişê bibêje ku zûgotinok ji hêla wateyê ve ne yekgirtî ne. Lew zûgotinok ew cûreya edebîyata gelêrî ye ku ji xeyalan zayîne, de'wa mantiq û hiş lê nayê kirin.

Zûgotinok beşek ji edebîyata kurdî ya devkî ye. Zûgotinok bi lihevanîna peyvên biqafîye û biaheng hatine çêkirin. Di bingeha zûgotinokan da carinan meselokên biwate û carinan jî ên bêwatê tên vegotin. Jixwe pir caran peyvên di nav zûgotinokan de jî bêwate ne. Hinek zûgotinok hene bê dawî ne; hinek kin, hinek dirêj in (Güneş, Gazeteipekyol).

Cureyên edebîyata gelêrî exleb bi devkî anku guh bi guh hatine veguhestin. Ji bo geşedana zimanê zarokan malî û malbat berê xwe dane cureyên edebîyata gelêrî. Cegerxwîn di berhema xwe ya bi navê *Folklora Kurdî* de vê yekê wiha piştrast dike: Kurd ji biçûkayî de zarokên xwe hînî van tiştan dikin. Hê ji pêçekê de, dê ji wan re dilorînî û dîrok, istiran û çîrokan dibêje. Lewra çawa çavê xwe vedikin û zimanê xwe digerînin, dest bi rîst û hûnan û istiranan dikin û bi her tiştî dilîzin û di şevbuhêrkên xwe de hînî wan tiştan dibin. Ji lewra dibêjin, ko zarokên Kurd xudriste, hozan û hişyar in, dengbêj û çîrokvan in (nql, Öztürk, 2016: 24-25).

2.1. SENIFANDINA ZÛGOTINOKÊN KURDÎ

Senifandina zûgotinokên Kurdî bi awayekî rêkûpêk nehatîye kirin. Senifandinek balê dibe li ser xwe ku ew jî ji hêla Mustafa Öztürk ve hatîye kirin. Öztürk di gotara xwe ya derbarê zûgotinokan de îlhama xwe ji senifandina Pertev N. Boratov werdigire: "...Meriv dikare zûgotinokên Kurmancî li gorî cihê bikarbûn an fonksiyonên wan, wekî lehîstikî,

xeberoşkî û yên serbixwe di sê beşan de bisenifîne. Cudahiya vê senifandinê ji ya Boratav ew e ku, di vir de zûgotinokên rewresmî nîne. Li gorî ku dixuye, ji bilî yên rewresmî zûgotinokên Kurmancî û yên Tirkî nêzîkî hev in" (Öztürk, 2016: 29). Em ê jî senifandina Öztürk veguhêzin.

2.1.1. Zûgotinokên Lîstokî

Zûgotinokên ku di nava lehîstikan de cih digirin wekî zûgotinokên lehîstikî têne binavkirin. Zûgotinokên bi vî rengî gorî mijarên xwe, carinan watedar in û carinan jî ji binî ve bêwate ne. Zûgotinokên lehîstikî, mijareke wan a diyar nîne. Ji ber vê taybetmendiya wan, meriv dikare metnbûna wan bike babeta nîqaşê. Divê meriv ji aliyê binyadê ve, wan di çarçoveya helbestê de bîne zimên (Kaya, 1999: 545).

2.1.2. Zûgotinokên Xeberoşkî

Di senifandina zûgotinokan de beşeke din jî zûgotinokên xeberoşkî ne. Zûgotinokên xeberoşkî cureyeke gelêrî ye ku, vegotinê ji bo kêfxweşkirin û şaşwazîkirina guhdaran amade dike (Cerrahoğlu, 2011: 283). Ev cureya zûgotinokan bi gelemperî di serî û paşiya çîrçîrokan de cih digire. Heke pêdivî hebe, li gorî mijarê, di navbera çîrçîrokan de jî tê bikaranîn.

Zûgotinokên çîrçîrokan carinan dirêj, carinan ji kurt in û dibe ku ji du sê bêjeyan pêk bên. Ev zûgotinok bi mebesta rengdayina vegotinê, balkişandina guhdaran tên bikaranîn û her wiha bêjerê çîrçîrokê, bi boneya van gotinên qalibgirtî arîkariyeke hêja bi dest dixe (Öztürk, 2016: 32).

2.1.3. Zûgotinokên Serbixwe

Ev cure zûgotinok, ji aliyê bikaranîn û hejmara xwe ve ya herî berbelav e. Zûgotinokên serbixwe, ji pêyvên bilêvkirina wan ne hêsan pêk tên. Ji ber vê yekê ji bo deng, kîte û bêjeyên zimên bi awayekî sererast bêne bilêvkirin, ev zûgotinok navgînên girîng in. Nemaze zarok, bikaranîna van berheman zimanekî herikbar, rast û bipergal bidest dixin. Jixwe mebest û peywira van zûgotinokan, ji xencî kêf û şahiyê ev e (Öztürk, 2016: 34).

2.2. CUREYÊN ZÛGOTİNOKÊN KURDÎ Lİ GORÎ CİHÊ BİKARANÎNÊ

Zûgotinok li gorî cihê bikaranîna xwe diguherin. Digel lîstokan, di destpêka çîrokan de û beravêtina hev a dengbêjan de jî tên bikaranîn. Di xebata kolektîf a bi navê *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı* de zûgotinok li gorî cihê bikaranîna xwe bûne sê beş.

2.2.1. Qinik

Qinik ew cûre zûgotinok in ku di serê çîrokên gelêrî de têne gotin.

Destpêka çîroka "Kuço Kuço" ya aîdî Herêma Botanê wiha ye: "Carek bû, cebarek bû, mişkek ketibû kaya me, kaya me dizîbû." Dîsa destpêka çîroka "Mamê Rûvî" ya aîdî Herêma Botanê wiha ye: "Çêrokê, çêrvanokê, dapîra min çû kolanokê. Berî beristan, payîz çû, ma zivistan, em ketin serê xoxên giran."

2.2.2. Bend

Dema degbêjên Kurd zûgotinokan bavêjin ber hev navê vê yekê dibe bend (Çakar, Işık, Mehmetoğlu, Sadıkoğlu, Önen, Tan, 2010: 54). Piştî lêkolîneke lîteratûrî me mînak ji bo vê cureyê peyda nekirin.

2.2.3. Zûgotinokên Lîstokan

Zullinger derbarê zûgotinokên lîstokan de wiha dibêje: Zûgotinokên lîstokan, bi peyvên tên zanîn û nayên zanîn, an jî bi peyvên çêbuwar têne damezirandin. Peyvên ku tên zanîn, di çarçoveya jiyana rasteqîn de xwedî cihekî ne, lê yên ku nayên zanîn xeyalî ne, anku ne rasteqîn in. Ên ku çêbuwar û bêwate ne jî her wiha dibe ku ji aliyê zarokan ve wekî rasteqîn bên pejirandin (Zullinger, 1997: 16).

Zûgotinok herî zêde xwe di lîstokên zarokan de didin der. Mekanê lîstokan berê dermal, hewş, serban, kolan, mal û wd. bû. Niha park, seyrangeh, bexçeyên apartmanan û wd. lê zêde bûne. Zûgotinok carina dibin lîstok bi xwe û carina jî dibin beşeke lîstokê. Bo nimûne, li mintiqeya Dihê/Botan lîstoka bi navê "Nîsk û Nohkê" bi zûgotinokê ve girêdayî ye û zûgotinok jî wiha ye: *"Nîskê, nohkê / mala 'Emer dûr e / bû teqreqa sabûnê / selam li Eyşan*

Xatûnê.” Zarok dema pîrikê (*ebe*) hilbijêrin gelek caran zûgotinokên lîstokan bi kar tînin. Bo nimûne li herêma Mûkrîyanê ji bo hilbijartina pîrikê ev zûgotinok tê gotin: *“fêsê fêsasê / bê dînê bê kirasê / heqlîn deqlîn / çerik çumul / bisk û mil / lolê yasîn gurçik.”*

BEŞA SÊYEM

3. ROLA ZÛGOTINOKAN BO GEŞEDANA ZIMANÊ ZAROKÊN PÊŞDIBISTANÊ

Armanca perwerdeya pêşdibistanê ev e: bi bikaranîna şahîyê hêsankirina hînbûnê û derfet avakirina ji bo hînbûna kiryarî û jîyînî ya zarokan. Di vê qonaxê de zarok bi çalakgerîya xwe derdikevin pêş. Her çiqas di qonaxa pêşdibistanê de zimanê îfadekar a zarokên pêş ketibe jî di mijara bikaranîna çalak a zimên de û ji bo duristkirina tengavîyên artikulasyonê girîngîya hin keresteyan derdikeve holê. Vegotin an jî xwendinaa çîrokan, zûgotinok, lîstok, mamik keresteyên sereke yên vê yekê ne.

Zûgotinok ew berhem in ku li gorî geşedana ziman û temenê zarokan in, zarok li gel şabûnê perwerde jî dibin. Anku zûgotinok ew keresteya tabiî ye ku zarok ji bo ku qabilîyeta zimanê xwe pêş bixin ew hilberandine (Ungan, 2009: 223).

Aheng di zûgotinokan de bi saya dengên nêzî hev pêk tê. Di zûgotinokên kurdî de gelek caran hebûna qafîyeyê ahengê temam dike. Her çiqas zûgotinok ji bo zarokan be jî lê hin jê ji bo mezinan in; çinku sehneyên erotîk lê bar in. Her wiha di hin zûgotinokan de xelitandina peyvan an jî dengan dikare bibe sedem ku navê organên cinsî bê telafûzkirin. Lew di perwerdeya pêşdibistanê de ne hewceyî van mînakan e.

3.1. JIHEVKIRINA HERFÊN BÊDENG ÊN NÊZÎ HEV

Di gramera kurmancî de 23 herfên (deng) bêdeng (*dengdar/consonants*) hene ku jê hin deng gelekî nêzingî hev in. Ev nêzikatî carina li gorî cihê derketina deng e, carina li gorî asta derketinê, carina jî li gorî asta domdarîyê wan e û carina jî li gorî her sê taybetîyan e. Berîya ku em bêdengên nêzingî hev bi zûgotinokan analîz bikin, em ê ewil tabloya taybetîyên bêdengan û rêjeya bikaranîna dengên Kurmancî bidin.

3.2. TABLOYA BÊDENGAN Û RÊJEYA BIKARANÎNA DENGÊN KURMANCÎ

Herfên (*deng/letter*) bêdeng (*consonants*) di derketinê de rastî astengîyan tên û bêyî alîkarîya dengdêran (*vowel*) dernakevin.

Li Gorî Cihê Derketinê Tabloya Bêdengan (Dengdaran)

Yên Lêvkî	Yên Diranî	Yên Pêşarikî	Yên Qirikî û Arikî
b,f,m,p,v,w	d,l,n,r,s,t,z	c,ç,j,ş,y	g,h,k,q,x

Li Gorî Asta Derketinê û Domdarîyê Tabloya Bêdengan (Dengdaran)

	Hişk	Nerm
Domdar	f,h,s,ş,x	j,l,m,n,r,v,,w,y,z
Nedomdar	p,ç,t,k,q	b,c,d,g

Her wiha em rêjeya tabloya dengên Kurmancî jî bidin dê baş be.[2]



[2] Notên dersa Rêzimana Kurmancî, Mikaîl Bilbil, serdema 2015-2016, Zanîngeha Artukluyê.

3.3. DENGÊN NÊZÎ HEV Û WEK ÇARESERÎ MÎNAKÊN ZÛGOTINOKAN

K-Q

Herfa “k” û “q” ji hêla cihê derketina dengan ve qirikî û arikî ne; ji hêla asta derketinê ve hişk in û ji hêla domdarîyê ve jî nedomdar in. Li gorî gramera kurmancî ev her du deng di hinek peyvan de pevguherînê pêk tînin. Bo nimûne: **k**izwan-**g**izwan, fê**k**î-fê**g**î, **k**utan-**g**utan. Di zûgotinokên kurdî de gelek mînakên derbarê “k” û “q”yê de hene. Li gorî rêjeya derketina dengan ve rêjeya “k” %3,6 e, ya “q” jî %1,4 e.

- *Kurm qurm qul kir*

Di vê mînakê de “kurm” û “qurm” qafîye (serwa) pêk anîne. Di risteya “qurm qul kir” de jî “k” zorê dide bilêvkirinê. Her wiha dengê “u” û “r” ji ber dûbarekirinê zorê dane telafûzê.

- *Qîr ma konê me ve*

  Konê me ma qîrê ve

Di vê mînakê de “qîr” û “kon” zorê didine bilêvkirinê. “qîr” û “kon” peyvên guherbar in di vê zûgotinokê. Zarok dema vê zûgotinokê bilêvîne û xwe xelet bike îhtîmal e ku wateyeke mustehcen jî jê derkeve. Lew ev mînak her çi qas ji bo cihêkirina “k” û “q”yê karhêner be jî tehlukeyeke veşartî jî di xwe de dihewîne.

L-R

Di zimanê kurmancî de herfa “l” û herfa “r” li gorî cihê derketinê “yên diranî” ne, li gorî asta derketinê “nerm” in û li gorî asta domdarîyê jî “domdar” in. Herfa “l” dema derdikeve dev nîv vekirî ye û ziman di navbera diranên jor û jêr de dişide. Herfa “r” dema derdikeve dev nîv vekirî ye û ziman li goştê piştê yên diranên jor dikeve.

Di hin peyvan de jî ev her du deng guherînê pêk tînin: şalû**r**-şalû**l**, a**r**îkar-a**l**îkar, ke**r**mêş-ke**l**mêş. Her wiha gava em rêjeya bikaranîna van her du dengan binêrin, em ê bibînin ku rêjeya wan a bikaranînê zêde ye; "r" %7,3 ye û "l" jî %3,1 e.

Dîsa di hinek peyvên Kurmancî de "l" û "r" cihê xwe vediguhezin hev û di gramera kurmancî de ji vê yekê re "peyguherîn/veguhêzîn" (*metatez*) tê gotin: şe**r**wa**l**-şe**l**wa**r**. Ji ber van sedeman em dişên bêjin ev her du deng gelek nêzingî hev in û lewma ji van her du dengan zayîna zûgotinokan mimkûn e.

- *Rûvî li rê livî*

  Rê li rûvî livî

Dengê "l" û dengê "r" di vê zûgotinê de çar caran dubare dibin. Dengê "v" jî wekî "l" û "r"yê li gorî asta derketinê ve nerm û li gorî asta domdarîyê ve jî domdar e. Lew hebûna "v"yê bilêvkirinê zortir kirîye.

- *Hêrûn û rûn û rêx li koxê*

  Min hêrûn û rûn car, ma rêx li koxê

Di vê zûgotinokê de kompleksek hem ji dengdêran û hem jî ji bêdengan (dengdar) çêbûye ku hem alîterasyon heye û hem jî qafîye, lê kêşa weznê tune. Di vê mînakê de peyva "rêx" û daçeka "li" lêk nakin. Zarokên pêşdibistanê bi vê zûgotinokê dikarin dengê "r" û "dengê "l" jêk bikin. Wekî din ji bo derbandina daçeka "li" jî mînakeke baldar e ku li gelek herêmên kurmancîaxêv daçeka "li" an nayê bikaranîn an jî "i" jê çûye û tenê bi awayekî pêwendî "-l" tenê maye: Ez ê li Sêrtê bim. /Ez ê Sêrtê bim /Ez ê'l Sêrtê bim.

S-Ş

Di rêzimana Kurmancî, tabloya bêdengan de dengê "s" û dengê "ş" li gorî cihê derketinê ji hev cuda ne, lê li gorî asta derketinê û domdarîyê wekî hev in. Dengê "s" li gorî cihê derketinê ji "yên diranî" ye; dengê "ş" jî li gorî cihê derketinê ji "yên pêşarikî" ye. Vêca her du deng li gorî asta derketinê "hişk" in, li gorî asta domdarîyê jî "domdar" in.

Guherîn di navbeyna van her du dengan de jî xwe dide der: **s**ist-**ş**ist, **s**ewt-**ş**ewt.

- *Şemo şemo, sê sêşeman, sê şo sabûn şabaş daye.*

Di vê zûgotinokê rista “s” û “ş” wiha ye: ş-ş-s-s-ş-s-ş-s-ş-ş. Peyvên bi “ş” û “s” dest pê dikin jî gelekî kîtekurt in. Her wiha ji hêla dengdêran ve jî “a”, “o” û “e” li gorî asta derketinê nizm in; li gorî cihê derketinê “a”, “o”, û “û” paşdevkî ne û “ê” û “e” jî pêşdevkî ne. Vêca ev taybetmendî bilêvkirina vê zûgotinokê hê zehmettir dike. Zarokên pêşdibistanê ji hêla geşedana zimên ve ji ber ku di qonaxa gramerê de ne ev mînak ji bo jevkirina dengê “s” û dengê “ş” mînakeke baldar e.

- *Şîvên Sofî Sîso şeş in.*

Di vê zûgotinokê rista “s” û “ş” wiha ye: ş-s-s-s-ş-ş. Anku sê heb “s” û sê heb “ş” hene, li gorî qayîdeyekî nehatine ristin. Esas qayîde jî nelihevkirina dengan de ye. Serê ewil “ş”, paşê sê heb “s” û dûvre jî du heb “ş” tên. Dubarebûna dengdêrên “î” û “o” bilêvkirinê hê bêtir xistîye zorê, exleb jî di gotina “sofî sîso” de. Zarokên pêşdibistanê ji ber domdarîya van her du dengan aşînayê van her du dengan in, lê da ku van her du dengan ji hev bikin aktîvîteya zûgotinokan baldar û bi bandor e.

T-Ç

Dengê “t” û dengê “ç” di gramera Kurmancî de li gorî tabloya bêdengan jî hêla cihê derketinê ve ji hev cuda ne. Dengê “t” ji hêla cihê derketinê ve ji “yên diranî” ye, dengê “ç” jî ji “yên pêşarikî” ye. Lê li gorî asta derketinê her du deng jî “hişk” in û “nedomdar” in. Ev her du deng jî her çiqas li gorî asta xwe ya derketinê “hişk” bin jî carin car asta hişkbûna wan di hin peyvan de dikeve û bêbêhn (unaspirated) têne xwendin ku di gramera Kurmancî de ji vê yekê re “rengedeng” (*allophone*) tê gotin.

Her wiha ji ber nêzingbûna wan ev her du deng rastî guherînê tên: **t**une-**ç**une, **t**u-**ç**u, **t**işt-**ç**işt, **t**êjik-**ç**êjik.

- *Şêxek li mala me ye, tacek li serê wî ye, tacê tu çi tov tac î.*

Ev zûgotinok li gorî vegotina xwe weke mamikekê dest pê dike lê bi kompleksa dengê “t”, dengê “c” û dengê “ç” bûye zûgotinok: “tacê tu çi tov tac î.” Dengê “c” jî weke dengê “t”

û “ç” asta wê nedomdar e, lê ji wan cuda ew hişk in, dengê “c” nerm e. Vêca di vê mînakê de hebûna peyvên kîtekurt gotinê zehmettir kirîye. Zarokên pêşdibistanê bi vê mînakê dikarin dengên “t” û “ç” ji hev bikin.

- *heft hirç, heşt hirç*

  her heft hirç, her heşt hirç

  her heft hirçê pişt bi pirç
  her heşt hirçê pişt bê pirç

Bi hebûna peyvên yekkîteyî, bêdengên nêzingî hev û dengdêrên nêzingî hev ev mînaka zûgotinokê baldar e. Di vê zûgotinoka kompleks de “f” û “ş”, “t” û “ç” cih diguherînin. Her wiha peyva “heft” û peyva “heşt” bi qafîye ne; peyva “hirç” û “pirç” jî. Dubarebûna peyva “her” –ku hem nêzingî “heft” e û hem jî nêzingî “hirç” e– vegotinê hê bêtir dijwar kirîye. Zarokên pêşdibistanê di aktîvîteya “zûgotinok”an de bi vê hevoka kompleks dişên dengê “t” û dengê “ç” ji hev bikin.

J-Ş-Z

Li gorî cihê derketinê dengê “j” û “ş” ji “yên pêşarikî” ne, “z” jî ji “yên diranî” ye; li gorî asta xwe ya derketinê “ş” hişk e, “j” û “z” jî “nerm” in; dîsa li gorî domdarîya xwe ev hersê deng jî “domdar” in.

Guherîna bêdengan hem di navbera “j” û “ş” de û hem jî di navbera “j” û “z” de xwe dide der: ku**ş**tin-diku**j**e, bira**ş**tin-bibirê**j**e, zagro**j**-zagro**z**, ez **j**î-ez **z**î.

- *Jajîyê Şûzîyan şûr e.*[3]

Di vê mînakê de lihevkirina “j” û “ş”, her wiha lihevkirina “ş” û “z”yê telafûza wê xistine di zorê de. Dîsa dengdêrên wekî “î” û “û” li gorî domkirina xwe “dirêj”, li gorî asta derketinê “bilind” in, li gorî cihê derketinê xwe “î” û “ê” dengdêrên dirêj ên pêşdevkî ne. Hasilê dengdêr jî di vê zûgotinokê de telafûzkirina dengên “j”, “ş” û “z” zortir kirîye. Ji bo geşedana zimên a zarokên pêşdibistanê ev yek mînakeke durist e.

[3] Jajî: cureyeke penîr e. Şûz: gundek e, li mentîqa Botan/Berwarîyê ye. Şûr: şor, di wateya tama bixwê de hatîye bikaranîn.

ENCAM

Zarokên pêşdibistanê ji hêla jîyanî ve di qonaxa lîstokê û ji hêla geşedana zimên ve jî di qonaxa gramerê de ne. Ji ber vê çendê mirov dikare bibêje zûgotinok ew cûreya edebîyata gelêrî ye ku di navbera van her du qonaxên hevterîb (*paralel*) de weke xêzekê ye. Zarokên pêşdibistanê di qonaxa gramerê de hêdî hêdî hînî cihê derketina dengan, ast û domdarîya dengan dibin, bi qayîdeyên zimên dihesin.

Perwerdeya pêşdibistanê ji ber ku temsîlîyeta "qonaxa lîstokê" ye, lewma em dikarin bibêjin ku lîstokên bi zûgotinokan, jiberkirina zûgotinokan û aktîvîteyên wekî van dibin sedem ku zarok hem bêdengên nêzî hev ji hev bikin, hem hînî axaftina herikbar û bêşaşî bibin û hem jî zewqê bistînin û şa bibin.

Di encama vê xebatê de hat fêmkirin ku dengên bêdeng ên nêzî hev ji bo ku bi awayekî rêkûpêk ji hêla zarokan -exleb zarokên pêşdibistanê- ve bêne telafûzkirin zûgotinok tên hana me. Zûgotinokên ku vê astengîyê aşt bikin di edebîyata Kurdî ya gelêrî de gelek in. Bi tabloya dengên bêdeng mirov dibîne ku ev dengên nêzikî hev belasebeb di zûgotinokan de cih nagirin, çinku li gorî cihê derketina deng(ên bêdeng)an, asta derketin û domdarîya wan ev deng di heman tabloyê de ne, anku xizmên hev ên nêzing in. Lewma jî tişteke normal e ku telafûza wan parîyekî zehmet be, di vê xalê de zûgotinok dikarin bibin çareserî ku digel hînbûnê zewq û şahîyê jî li zarokan didin peydakirin.

ÇAVKANÎ

Kitêb-Kovar

BUDAK, S (2002), *"Psikoloji Sözlüğü"*, Ankara: weş. Bilim Sanat.

CEGERXWÎN, (1988), *"Folklora Kurdî"*, Stockholm: weş. Roja Nû.

CERRAHOĞLU, Münir (2011), *"Yalanlamalı Sözler İle Masal Tekerlemeleri Arasındaki Benzerlikler"*, k. MKÜ Sosyal Bilimler Enstitüsü, c. 8, j. 15, r. 281-293.

ÇAKAR M. Sait, IŞIK Fehim, MEHMETOĞLU Mehmet, SADIKOĞLU Esra, ÖNEN Ronayi, TAN Sami (2010), *"Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı"*, Stenbol: weş. Tarih Vakfı.

EKİNCİ, O. (2001), *"Okul Öncesi Eğitimin İlköğretim Birinci Sınıf Öğrencilerinin Başarısı Üzerine Etkisi"*, Teza Lîsansa Bilind a Çapbûyî, Dîlok: Gaziantep Üniversitesi Eğitim Bilimleri Ens.

ERDEM, İlhan (2013), "*Konuşma Eğitimi Esnasında Karşılaşılan Konuşma Bozuklukları Ve Bunları Düzeltme Yolları"*, k. Zanîngeha Semsûrê Enstîtuya Zanistên Civakî, s. 11, j. 6, Semsûr.

İHTİYAÇ AKADEMİ (2016), *"Eğitim Bilimleri Gelişim Psikolojisi"*, Stenbol: İhtiyaç.

KAYA, Doğan (1999), *"Anonim Halk Şiiri"*, Ankara: weş. Akçağ.

ÖZTÜRK, Mustafa (2016), *"Zûgotinok Di Edebîyata Kurdî ya Gelêrî De"*, Bingöl Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, s. 2, c. 2, j. 3, r. 23-43.

VYGOTSKY, L. S. (1998), "*Düşünce ve Dil"*, w. S. Koray, Stenbol: Toplumsal Dönüşüm

UNGAN, S. (2009). "*Dil Gelişim Aracı Olarak Tekerlemeler"* k. Zanîngeha Pamukkale Zanistên Civakî, s. 1, j. 2, Denizli.

ZULLINGER, Hans (1997), *"Çocukta Oyunla Tedavi"*, w. Kâmuran Şipal, Stenbol: weş. Cem.

Malper

GÜNEŞ Mehmet, Gazeteipekyol http://candname.com/zugotinok-ci-ye/

DAĞABAKAN F. Ö, Dağabakan D. (2006), *"Dil ve Çocukta Dil Gelişim Kuramları",* ji malpera www.ooegm.meb.gov.tr 5'ê Adara 2011'an hatîye wergirtin.

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

OKUL ÖNCESİ ÇOCUKLARDA TEKERLEMELER SAYESİNDE YAKIN SESSİZLERİN TELAFÜZ EDİLMESİ

Sevda BASUT

15721085

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

OKUL ÖNCESİ ÇOCUKLARDA TEKERLEMELER SAYESİNDE YAKIN SESSİZLERİN TELAFÜZ EDİLMESİ

Sevda BASUT

15721085

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018